	**Meymûnê wekî dadger** übersetzt von Mahmut Aydin
	Berê, dema ku hema hema hemû ajal hê jî bi serbestî digeriyan û tenê çend ji wan bi mirovan re dijiyan, kûçikek û pisîkek li mala zanyarekî dijiyan. Rojekê vî zanyarî kûlîçeyeke teze wek diyarî girt. Ji ber ku diviyabû ew çend demjimêran ji malê derbiketa, ji bo tiştek pê neyê, ew danî ser refika ku bi dîwêr ve daliqandîbû.
	Pisîkê bi baldarî li zanyar temaşe kiribû, û gava ku ew ji derî ve derket, xwe avêt ser kursiya ji cîl a ku li ber pencereyê bû, ji wir jî bazda ser maseyê, ji ser maseyê jî bi bazdanek bihêz û direj bazda ser refikê. Bizmarê bi zorê bi cîlên hûnandî refik bi dîwêr ve girtibû, xwe li hemberî vê bazdana bihêz negirt. Refik bi paste û pisîkê re, bi hêwirze hatin ketin xwarê. Kûçik tevlixew xwe li ber tava rojê direjkiribû, li benda vegera xwediyê xwe bû.
	Ji ber dengê ji nişkan ve ji cihê xwe veciniqî, bi lez derbasî hundirê jûrê bû. Dema pasteya bêhnxweş di nava pencên pisîkê de dît, ber bi wê ve bazda û xwest pasteyê jê bigire. Pisîkê bi qîjînî bertek nîşan da, pencek xwirt avêt pozê hevalê xwe yê malê. Kûçik kir kûzekûz.
	Meymûnê ku li ser dîwarê baxçe werziş dikir, di pacê re bi meraqdarî li wan temaşe dikir. Kêfa xwe bi wan anî û got "Hûn her du çima di hewayeke wiha xweş de pev diçin? Kûçik bihêrs ewtiya û got, "Vî pisîkê diz ê kêrî tiştekî nayê pasteya xwediyê me didize!"

	Pisîkê bihêrs got, "Çi ji te re? Dema te xwe bi teralî li ber tavê direj kiribû, min têra xwe zehmetî kişandin. Min paste bi keda xwe qezenc kir!" Kûçik giricî û got “Cinawirê bêhiş û xweperest, tu bawer dikî, tu yê pasteyê bi serê xwe bixwî? Ew ya xwediyê me ye, para min jî tê de ye.”
	Meymûn dibêje, "Rawestin, pevneçin! Paste ji bo we herduyan têra xwe ne mezin e?" Ez li ser maseyê mêzînekê dibînim. Ez ê vê pasteyê ji bo we bikim du beşên bi qasî hevdu." Kûçik û pisîkê, herduyan jî ev pêşniy pejirandin.
	Wan bi heyecan temaşe kirin, ku meymûnê çawa paste kir du perçe, nîvê wê danî ser çaviyeke mêzînê û nîvê din jî danî ser çaviya mêzînê ya din. Çaviyek mêzînê got tep, ket xwarê. Meymûn bi awirekî cidî got “Ev aliyê han hinekî giran e.” û ji aliyê giran bi dilxweşî çend parî jêkir û bi dilbijîn avêt devê xwe. Kûçik û pisîkê bi hêvî lê temaşe dikirin ku çaviya mêzînê ya giran çawa bilind dibe. Kûçik deng lê kir, got “Niha baş e!”
	Meymûnê bi tundî got, "Na!" "Ev parçeya pasteyê hîn jî giran e. Nabe ku li pişt min bê gotin, ez dadgerekî bêedalet im." Bi van gotinên xwe re dîsa ji pasteyê parçeyekî piçûk ê din qetand diqetîne û avêt devê xwe. Lê ji ber ku wî ji vê çaviyê zêde girtibû, vê carê çaviya din a mêzînê hat xwarê. Meymûnê di ber xwe de çend peyv gotin û dest pê kir, ji aliyê din parçe bi parçe jêkir û bi kêfxweşî avêt devê xwe, heta ku her du çaviyên mêzînê hêdî hêdî nêzî hev du bûn.

	Cara dawîn ji aliyê mezin parçeyek mezin hilda, ev parçe ji yê din piçûktir bû û ev çaviya mêzînê jî bilind bû. Diviyabû wî ji nû ve dest bi karê xwe bikira. Vê pêvajoyê berdewam kir, heta çaviyek mêzînê bi tevahî vala bû û di çaviya din de jî bi tenê parçeyek pir piçûk ma.
	Ew li vir hers ket , bi kûçik û pisîkê re xeyidî û got:“Hûn ji bo tiştekî wiha piçûk û pêkenok pevdiçin û hewl didin ku min jî ji bo vê bikin hekem! Divê hûn şerm bikin! Di encamê de ji bo ku aştî pêk were, vî parçeyê mayî jî ez ê bixwim." Ew wî parçeyê dawîn jî avêt devê xwe û di pacê re deket û çû. Kûçik û pisîk bi şaşwazî li çûna wî temaşe dikin.
	Pisîkê kire mirremir û got, "Ya ku te niha kir, ev e!“ Kûçik giricî û bersiva wê da, got "Tu çima wisa çikûs bûyî?” û cardin çû li cihê xwe yê bi tav xwe dirêj kir. Kir hurmehurm, got “Êdî mirov nikare bi kesî bawer bibe” û dîsa ket xewê.
	Dawî